Lê, pirsa biyantir ewe; Gelo çima xwediyên cudatiyê windabûn û me ew di nav ewan partiyan de nedîtin, an jî weke di rojên îro de, ew nebûn serokên ewan partiyên ji hev cuda bûbûn, tenê hejmareke biçûk û ew jî yên li derve ku, dûrî cudatiya ewan hevalên girtî bûn . Wilo yek dikare bipirse: Ka ew cudatiya ku, di navbera hevalên girtî de, gihêşte evan hevalên li derve, yan jî hinekan xwest evên li derve rê li pêş pirojeyên ewên girtî bigre û evana weke şûngir ji wan re pêşkêş bike. Lê pirsa mezintir, li gor têgihêştinên me, ev e; Gelo çima piştî ew partî perçe dikin, em tu partiyan di bin navê Kurdistan de nabînin û ne jî tu partiyên nuh, ewê bernameya "Partî" ku, ji bo wê li hevnekiribûn, hilnagire û di bin konê wê de naxebite.

Û wilo zincîra perçebûnê dê bajo heya rojên me yên îro ku, weke me got: Nema yek navên partiyan ji hev derdixe û ne jî tu cudatiyê di nav bernameyên wan de dibîne; Eger ku em li ewan siloganên wan ên bi mij û dûman, weke bername, binirin û bibînin û karibin di roja îro de ji xwe re belge bijmêrin û li ser ewê yekê karibin li mafên gelê xwe xwedî derkevin.

Mixabin evan "bernameyên partiyan" û weke ku, me berê jî di gotareke xwe de gotibû; Hêşt ku, ne tenê miletê me, lê heya serok û rêberên wî jî nizanibe ew çi dixweze û ne tenê wilo; lê bighe pileya ku, ew destê xwe têxe yê dewletê, ji bo ku serhildana miletê xwe bide rawestandin. Û piştî ku, ew yek bi cih bête; Rabe ew dewlet hêzên xwe yên ewlekariyê bi ser te de bişîne û li ber destê sibeyê û li ber bêcemeyên xewê te ji nav zarok û mala te, bi pihîn û kulemistan, derîne û bêyî tu zanibî ji ku ve û ji aliyê kê ve; Ji ber ku, ewana çavên te girêdane, dê wêneyeke zor wêran be ji tevgera neteweyekê re.

Lê, hîne ya kambaxtir ku, piştî bîst rojan ji girtin û êşkenciyê û dema te berdin, ne tu û ne jî partiya te wêribe dazanekê bide belavkirin û têde ewê karê teror pirotesto bike yan jî daxwaza mafên te bike û hîne dewlet di evê yekê de ranewste; ew ji te dixwaze ku, ne tenê tu dengê xwe dernexî û nebêjî: ez dame ber lêdan û êşkenciyê, lê zimandirêjî bighe ewê asteya ku, ji te dixwaze tu ji wan re sîxor kar bikî û tu endamekî navenda partiyeke Kurdî ku, ji bo daxwaza mafê miletekî ve hatiye damezrandin.

Belê û weke di ewan nimûneyan de, ji me re, tête sayî kirin ku, asta xwestekên me pir û pir nizim bûye û xêzên sor, her û her, sitûrtir dibûn û gihêşt ku, Tevgera Kurd xwe rût bimîne; Çi ji aliyê dost û hevalan ve be û çi jî ji aliyê xwestek û bernameyên xwe ve be. Lê di rojên îro de û weke ku, em dibînin heyam û hokerên cîhanê tev têne guhertin û di nav de yên rojhilat û bi taybetî yên Kurdan. Lewre û eger ku, em bixwezin xwe weke jimareke xurt di Sûryê de bidin naskirin, hinek guherîn û xwestek ji me têtin xwestin.

Li gor dîtina me û ji berî her tiştî din, divê ev partiyên hene û di evan demên nêzîk de kongirên xwe çêbikin; Hin partî bi evê gavê rabûn. Lê xwestek ne ewe ku, tenê heval bêne cem hev û kongirekî lidarbixin; dema em daxwaza kongirên partiyan dikin. Em dixwezin ew evan kongiran ji xwe re bikin rawestgehine nuh, da ku, karibin careke din partiyên xwe bînin ser ewê riya